

## Bihevgihandina malbata zarokê ku mafê parastina navneteweyî wergirtiye

Ev şîret bo te ye eger tu ji 18 salî kêmtir bûyî gava ku te dawa penaberiye kiriye û te penaberî yan parastina dereceya duyem wergirtiye.

Malbatiyên te dikarin dawa îqameyê ji Finlandayê bikin ji ber ku te îqame li Finlandayê wergirtiye. Endamê malbatên zarokî anku kesê kêmtir ji 18 salî dêbavên (nêrevan) wî ne.

### Di kîjan haletan de tu wek zarok û loma dêbavên (nêrevanên) te wek malbatiyan (malbatiyên) te tên hesabandin:

Eger tu hê jî kêmtir bî ji 18 salî gava ku Daîreya Koçberan biryarê li ser **daxwaza îqameya dêbavên (nêrevanên) te bike**, dêbavên (nêrevan) wek malbatiyên te tên hesabandin.

Eger tu bûbî 18 salî berî ku **daxwaza îqameya dêbavên (nêrevanên) te bike**, dêbavên (nêrevan) wek malbatiyên te tên hesabandin eger:

- tu kêmtir ji 18 salî bî wê rojê gava ku te dawa penaberiye kiriye
- tu bêyî dêbavên (nêrevanên) xwe hatibî Finlandayê dawa penaberiye bikî û
- dêbavên (nêrevanên) te daxwaza îqameyê kiribe ji ber têkiliya malbatî **di sê mehan de** ji wê rojê gava ku te **biryara mafê penaberiye yan parastina dereceya duyem wergirtiye**

Eger tu bûbî 18 salî berî biryara li ser daxwaza îqameya dêbavên (nêrevanên) te û ew ji Finlandayê dawa îqameyê bike **pişfî dema diyarkirî ya sê mehan**, ew êdî li gor qanûnê ne endamê malbata te ye (ne).

### Malbatiyên te wiha di dema sê mehan de dawa dikin:

Malbatiyên te divê berî hatina Finlandayê dawa îqameyê bikin. Mirov dikare îqameyê li ser kaxezê bide balyozxaneyê yan li navenda îqameyê yan bi elektronîkî li ser malpera Enter Finland.

### Radestkirina dawanameya kaxezî

Amadekariyên bo dawakirina îqameyê baş e ku yekser pişfî wergirtina îqameya xwe dest pê bikî. Malbatiyên te belkî bo nimûne hewceyî vîzeyê bidin daku bikarin biçin dawanameya xwe bidin balyozxaneyê yan navenda îqameyan. Malbatiyên te bi xwe berpirsyar in ku di dema diyarkirî de dawanameya xwe radest bikin.

Malbatiyên te divê ji malpera wezaretê derve ya Finlandayê finlandabroad.fi lê binêrin ka dikarin li kû û çawa îqameyê radest bikin û çawa demekê bo radestkirina îqameyê bigirin. Daîreya Koçberan nikare tesîrê li wê bike ka divê li kû û kengî malbatiyên te îqameyê radest bikin. Hemû kesên dawa îqameyê dikin, divê biçin cihê radestkirinê, zarok jî.

---

### **Eger bo radestkirina dawanameyê demgirtin ne hewce be:**

Eger bo radestkirina dawanameyê demgirtin ne hewce be, dawaname divê di dema sê mehan de were radestkirin. Istisna ji dema diyarkirî tenê di hinek haletên taybet de mimkin e eger sebebekî giring hebe.

### **Eger bo radestkirina dawanameyê demgirtin hewce be:**

Eger bo radestkirina dawanameyê demgirtin hewce be, malbatîyên te divê di zûtîrîn demê de û herî dereng di heyama sê mehan de têkiliyê li gel balyozxaneyê yan navenda îqameyê bigirin daku dawanameyan radest bikin. Divê ew bo radestkirina dawanameyan demekê bigirin.

Gava ku ew dem bigirin, divê ew agahiyên hemû wan kesan bidin ku dixwazin dawa îqameyê bikin.

Divê ew van agahîyan bidin:

- navên temam yên hemû dawakeran, demên deqîq yên jidayikbûnê û welafîniyên wan
- navê te, dema jidayikbûna ye (te) û welafîniyên wan (te) û hejmara mişteriyatiya te li Daîreya Koçberan.

Eger malbata te wek şîretkirî bike, lê ew di dema sê mehan de nikarin ji ber dora dirêj ya demgirtinê nikarin demekê bigirin, ew dîsa jî dikarin wek malbatîyên te dawa îqameyê bikin. Malbata te dive yekem dema mimkin bigirin û û ( ev û ya zêde ye) bo radestkirina dawanameyên îqameyê radest bikin.

Istisna ji dema diyarkirî tenê di hinek haletên taybet de mimkin e eger sebebekî giring hebe.

### **Radestkirina dawanameyê li ser malpera Enter Finland**

Malbata te dikare dawa îqameyê herwiha li ser malpera Daîreya Koçberan ya Enter Finland ([enterfinland.fi](http://enterfinland.fi)) jî bike. Dawanameya elektronîkî divê di dema sê mehan de were radestkirin. Istisna ji dema diyarkirî tenê di hinek haletên taybet de mimkin e eger sebebekî giring hebe.

Gava ku malbatîyên te dawanameya xwe li ser malpera Enter Finland radest kir, divê ew hê nasnameya xwe bibin kontrolkirinê. Malpera Enter Finland dê şîretên pêwîst li ser vê bide wan.

### **Dawaname bi pare ne**

Dawakirin bi pare ye. Bihayên dawanameyan li ser malpera Daîreya Koçberan in [migri.fi](http://migri.fi)

### **Agahiyên zêdetir li malpera Daîreya Koçberan**

Agahiyên zêdetir derbarê dawakirina îqameyê li ser malpera Daîreya Koçberan hene [migri.fi](http://migri.fi).